Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1299 17-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Canoyê 12 salî dildarê muzîk û hunera Kurdî ye

Hemza Sêvo/ Qamişlo

**Caniyar Bedir zarokekî Kurd e. Ji ber ku ew dildarê muzîk û hunera Kurdî ye, sê amûrên muzîkê anîne û hewl dide bibe muzîkjenekî binavûdeng. Caniyar anî ziman ku hêviya wî ew e asta hunera xwe li pêş bixe û Beşa Muzîkê li Peymangeha Bilind a Hunerê bixwîne.**

### Caniyar dixwîne û xwe hînî muzîkê jî dike

Cano an jî Caniyar Bedir zarokekî 12 salî ye, li gundê Nisran ê girêdayî bajarê Tirbespiyê di dawiya sala 2013'an de hatiye duniyayê. Li gundekî biçûk û malbateke ku ji 7 kesan pêk tê çavê xwe vekir, 3 bira û xwişkeke wî hene, ew kurê herî biçûk e. Caniyar li dibistana gundê xwe dixwîne, ew ê refê 7'an bixwîne, Cano di xwendina xwe de cêhatî ye û her tim pileyên bilind bi dest dixe. Ev nêzî çar salan e ku dest bi hînbûna muzîkê kiriye. Apê wî Ebdilcelîl Bedir jî muzîkjeneke û carcaran stranên folklorî dibêje, ji ber wê jî Cano bi hunera wî bandor bûye û daxwaza fêrbûna tembûrê li apê xwe kiriye.

### Ji hunera Mihemed Şêxo û Şivan Perwer hez dike

Di bîr, hiş û sewdanê her zarokekî de armanc û xwestekek heye, hem jî ji qadeke taybet hez dike. Caniyar Bedir jî yek zarokên Kurdan e ku bi çanda Kurdî ve hatiye girêdan û ji hunera hunermendên kevnar hez kiriye. Cano bi taybet ji hunera hunermend Mihemed Şêxo û Şivan Perwer hez dike. Ji ber heskirina wî ji van herdu hunermendan re, Cano parçeyên stranên wan di ramanên xwe de meyandiye û bi hestê xwe dibêje, çendîn hinek lawazî di lêdana tembûrê û dengê wî de hebe jî, lê ruhê fêrbûna amûrên muzîkê û zanista stranbêjiyê li cem wî peyda dibe.

### Sê amûrên wî yên muzîkê hene

Ji ber heskirina Cano ji muzîkê re û hewldana wî ji bo fêrbûna hunera muzîkjeniyê, wî def, tembûr û org li cem xwe kom kirine. Hêjayî gotinê ye ku hunermend Ratib Şêxmûs tembûrek diyarî Cano kiriye. Ew gav bi gav xwe fêrî her sê amûran dike. Cano bi armanca fêrkirina



alava tembûrê, diçe li gel lawê apê xwe Ehmed Ebdilcelîl Bedir, Ehmed jî ciwaneke ku xwe hînî sazkirina tembûrê kiriye. Cano di dema xwe ya vala de diçe li gel Ehmed û xwe fêrî lêdana tembûrê dike.

### Hêviya wî Peymangeha Bilind a Hunerê bixwîne

Di dilê her zarokekî/ê de hêvî, daxwaz û xeyalek heye, di qonaxa zaroktiyê de jî zarok bi siberoja xwe dihizire. Caniyar jî yek ji wan zarokên xwedî hêvî ye. Cano diyar kir ku hêviya wî ew e ku xwe li pêş bixe da ku Peymangeha Bilind a Hunerê ya Rojava bixwîne û wiha got: " Ez niha di destpêka temenê xwe de me, xwendina xwe didomînim. Di nav xwendinê de metriyala herî şêrîn li ber dilê min a muzîkê û metriyala zimanê Kurdî ye. Li dibistana gundê me guhdana mamosteyan bi metriyala muzîkê heye. Di waneyên muzîkê de ez û keça apê xwe Sîdra bi hev re stranan dibêjin, ew stranan dibêje û ez jî pê re tembûrê dijenînim. Armanca min ew e ku di siberojê de ez beşa muzîkê li Peymangeha Bilind a Hunerê bixwînim, lê ji beriya wê divê ez xwe baş di warê muzîkê de li pêş bixim û derbasî perwerdeyên muzîkê bibim."

## Gotina Dawî



### Planên Tirkiyê têk diçin!

Mihemed Seydi

Piştî komkujiyên ku li Siwêdayê bi destê komên ser bi Colanî ve pêk hatin, çavê hemû gelê Sûriyê ji bilî tunderew û derdorên wê, li Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Her kes bendewariya gavên rêveberiyê bû ku pêşî li van komkujiyan bigre an jî cihên ku destê wê dighêje, barê xelkê Sûriyê hinekî sivik bike. Beriya Siwêdayê li Beravê jî komkujî pêk hatin û dîsa Rêveberiya Xweser hemû derfetên xwe seferber kirin û xistin xizmeta Sûriyên Elewî û vê carê jî destê alîkariyê dirêj kir û bi hemû awayî xwest ku ev komkujî rawestin.
Li aliyê din, ya ku herî zêde ji vê rola ku Bakurê Sûriyê girt ser milê xwe aciz, dewleta Tirk bû. Ji ber dît ku hevalbendên wan yên li Şamê her roj rûyê wan tê reşkirin û hêza QSD'ê roj bi roj nav û dengê wê li nava tevahî Sûriyê bilind dibe. Elewî dibêjin ew QSD qebûl dikin da ewlehî hebe û Siwêdayî jî bang dike da ku hêza bi pêşengiya Kurdan bibe benda li pêş çete û barbarên ser bi Colanî ve ku xelkê Sûriyê dikujin. Vê helwestê di qada navdewletî de jî şewqa QSD'ê ku bibe bingeh ji bo ewlehiya tevahî Sûriyê bilind kir. Dewleta Tirk a ku dît destê hevalbendên wê li hember Kurdan kin dibe, wezîrê Karê derve yê Tirkiiyê Hekan Fîdan bi lez çû Şamê û ji wan re got hemû danûstandinên bi QSD'ê re rawestînin.
Hemwextî vê tevgera dewleta Tirk û hin aliyên ku Colanî di bin kontrola wan de ya xweşkirina rûyê desthilata Şamê qaşo dixwazin Sûriya demokrat bikin û ne ew in ku komkujî pêk anîn e, li bajarê Hesekê konferansa hemû pêkhateyên Sûriyê hat lidarxistin. Di vê konferansê de ev cara yekem bû ku dengên Sûriyan bi hemû rengên xwe tê bilind kirin. Ji Siwêdayê Durzî û ji Beravê Elewî, ji Cezîrê Kurd û Ereb û ji nava Sûriyê mirovên qedirbilind beşdar bûn. Vê yekê sewiya Rêveberiya Xweser hîne bilind kir ku ji herkesî re raber kir ew dikare hemû pêkhateyan li hev bicivîne û ji aliyên dijber re jî eşkere kir ku wê bi mejiyê şovenî û tundrewiyê ev welat ava nebe.
Herwiha ev rewşa li Sûriyê jî yekser bi pêvajoya ku di navber dewleta Tirk û rêber Apo de dimeşe ve girêdayî ye. Desthilata Tirk wiha difikire ku dema ew bi Abdullah Ocalan re danûstandinê bikin, ew ê Rojava lewaz bikin û bihêlin QSD'ê çekên xwe radestî Şamê bike. Bi vî awayî jî siyaseta qirkirinê ya li hember gelê Kurd li Rojava meşand û nekarî bighîne serî, ew ê bi riya vê pêvajoyê pêk bîne; ango Kurd çekan radest bikin û wiha werin daqurtandin. Lê Konferasa li Hesekê planên hemûyan daqurtandin. Dîtin ew nikarin Kurdan di Sûriyê de bêbandor bikin, vê carê wezîrê karê derve QSD'ê bi astengkirina danûstandinan tewanbar kir û di bin re zext li Şamê kir da li Parîsê bi Rêveberiya Xweser û Fermandarê QSD'ê re hevdîtinê neke.
Dîsa di hemwextî gurkirina xîtaba kuştina Kurdan li Şamê, dewleta Tirk dezgehên Ragihandinê yên ku li Hewlêrê bi zimanê Kurdî jî weşanê dikin xistin dewrê û li ser navê qaşo serokên Eşîrên Ereb û siyasetmedarên Kurd kes derxistin ser ekranan û dev avêtin QSD'ê. Di vir de, divê desthilata li Başûr a ku naxwaze Kurd bê maf bimînin, van çavkaniyên xirabiyê bêdeng bike. Ji ber siyaseta ku dewleta Tirk bi salaye dimeşîne, îro bûye sebeb ku roj bi roj dor lê teng bibe û encamên wê têkçûn be. Bakurê Sûriyê bûye hêz û ev hêz hêdî hêdî mezintir dibe û baweriya hemû xelkê herêmê jî distîne. Yê dijminatiya wê jî bike ew ê ti çarenûseke wî ya bi xêr nebe.

## Sudoku:Pirs 53

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | | | | 3 | | 9 | | |
| 4 | | | | | 8 | | 5 | |
| 2 | 7 | | 1 | | | | | 8 |
| | | 7 | 5 | 9 | | | | |
| 5 | | | 3 | 2 | 7 | | | 6 |
| | | | | 8 | 4 | 1 | | |
| 1 | | | | | 3 | | 4 | 7 |
| | 4 | | 2 | | | | | 1 |
| | | 2 | | 1 | | | | 9 |

## Sudoku: Bersiv 52

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | 6 | 8 | 4 | 5 | 3 | 2 | 1 |
| 2 | 3 | 5 | 7 | 1 | 6 | 9 | 8 | 4 |
| 8 | 4 | 1 | 2 | 3 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 1 | 6 | 3 | 4 | 9 | 2 | 8 | 5 | 7 |
| 7 | 8 | 4 | 6 | 5 | 3 | 1 | 9 | 2 |
| 5 | 9 | 2 | 1 | 8 | 7 | 4 | 3 | 6 |
| 4 | 5 | 7 | 3 | 6 | 8 | 2 | 1 | 9 |
| 6 | 1 | 8 | 9 | 2 | 4 | 5 | 7 | 3 |
| 3 | 2 | 9 | 5 | 7 | 1 | 6 | 4 | 8 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Têrê êvarê ye:**
- Ne birçî ye; ji ber ku ne birçî ye nan naxwe.
**Tî û birçî çû:**
- Bêxwarin û bêvexwarin çû.
**Tu dibêjî qey bi koran re dixwe:**
- Pir qelew e.
**Tu mûyekî ji laşê wî bikişînî wê bez pê re derkeve:**
- Bi heman wateyê.
**Xîzarek qirika wî nabire/qirika wî xîzarek nabire:**
- Bi malê xelkê wisa qelew bûye.
(Dema yek ji yekî qelew ne xweş be jê re wisa dibêje)
**Xwere ye/xwera ye:**
- Ji xwarinê pir hes dike; xwarinê pir dixwe.
**Zikê xwe diçêrîne:**
- Ti karê wî nîne, sirf ji bo ku xwarinê bixwe li malan digere.

**LI SER PIRXWARINÊ**

**Binçeng lê rast kirin:**
- Pir xwar.
**Cercere ye:**
- Her tiştî dixwe û dihêre.
**Em bûn ga:**
- Me pir xwar; cih di zikê me de nema.
**Em di ber re razan:**
- Me pir xwar.
**Ka ne ya te ye ma kadîn jî ne ya te y?:**
- Xwarin ne ji kîsî te ye, pereyên te lê neçûne, ma zik jî ne yê te ye?
(Dema yek xwarinê pir dixwe hingê jê re tê gotin)
**Me zikê xwe kir kuç:**
- Me pir xwar.
**Simbêl tê de ba dan:**
- Pir xwar.
**Tingînî ji binê sêniyê anî:**
- Di sêniyê de tiştek nehişt.
**Xwe rast kir:**
- Pir xwar; xwar heta ku zikê wî tijî bû; cih di zikê wî de nema.
**Zikê xwe da ber:**
- Pir xwar.
**Zik li xwe kir meşk:**
- Pir xwar; xwar heta zikê wî werimî; xwar heta zikê xwe rast kir.
**Zik li xwe kir bendeke:**
- Pir xwar; zêde xwar; xwar heta ku zikê wî werimî. (26)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Şehadeta Mam Zekî bû destpêka berxwedaneke nû'



Rojnamevan Argêş Şengalî diyar kir ku Mam Zekî mîna çemê ku di nav zinarên hişk re diherike, di dilê her Êzidiyekî de cihê xwe çêkir û wiha got: "Mam Zekî, mamê her Êzidiyekî ye ku dixwaze di nav azadî û rûmetê de bijî."**R-5**

## Sîstema herî guncav ji bo siberoja Sûriyê nenavendiya siyasî ye

Berpirsê Beşê Peywendiyan yê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk D. Luqman Ebdullah diyar kir ku sîstema navendî ji bo Sûriyê nabe, Sûriyê ji gelek netewan pêk tê û ev sîstem demokrasiyê nagire nav xwe; ji bo wê sîstema nenavendîbûna siyasî sîstema herî guncave ku pirsgirêkên Sûriyê pê çareser bibin.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1299 17-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S



## 'Sîstema nenavendî misogeriya mafê hemû pêkhateyan e'

Jinên Suryanî dan diyar kirin ku pergala nenavendî modeleke guncav ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û misogerkirina mafê hemû pêkhateyên ku li ser xaka Sûriyê dijîn.**R-2**

# 'QSD'Ê HÊVIYA TEVAHÎ PÊKHATEYÊN SÛRIYÊ YE'

Rêveberê Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê li ser bingeha parastina tevahî pêkhateyên Sûriyê ava bû, di nava 10 salan ji têkoşîneke bêhempa de, QSD'ê dikarîbû bibe hêza parastina tevahî pêkhateyên Sûriyê û ji bo parastina mirovahiyê ji xeteriya DAIŞ'ê berdêlên giran da. Herwiha Qeremox destnîşan kir ku QSD'ê parastina her mirovekî li Sûriyê erka xwe ya bingehîn dibîne.**R-4**





## Bi desteka şaredariyê û gel wê çanda paqijiyê pêş bikeve

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Dêrikê Ciwan Hesen diyar kir ku şaredarî her tim di nav kar û xebatê de ye, lê pêwîstî heye ku gel jî bi erkê xwe rabe û destekê bide karmendên şaredariyê.**R-6**

## Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 3 cihên şûnwariyê...(3)

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê; Nebî Hûrî, Girê Mozan û Keleha Sukera ye.**R-7**






**Destwerdana Tirkiyê, Rola HTŞ û Rêyên Çareseriyê!**
Idrîs Henan R-5



**Mucîzeya Fîşeka 15 Tebaxê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Cejna Vejînê**
Remezan Olçen R-7

# Sîstema nenavendî misogeriya mafê hemû pêkhateyan e

Jinên Suryanî dan diyar kirin ku pergala nenavendî modeleke guncav ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û misogerkirina mafê hemû pêkhateyên ku li ser xaka Sûriyê dijîn.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Piştî salên dûrûdirêj ji zilm û paşguhakirina pêkhateyan, îro Sûriyê dikeve qonaxeke nû ji avakirin ê, hêviya pêkhateyan di guhertinê de hebû, lê hikumeta veguhêz dîsa heman fikir û hişmendiya rêjîma Baas ya berê dimeşîne ku li ser bingeha paşguhkirin û dûrxistina pêkhatyan û jinê xwe ava dike. Sîstema herî pêşketî ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û parastina xaka wê ji dabeşkirinê pergala ne navendî ye ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê serkeftina vê ezmûnî hat teqez kirin. Hikumeta veguhêz dîsa hêviyên gelan dişkîne û li ser navendiya Sûriyê teqez dike ku berovajî berjewendiyên gel tê.

Di 17'meha Tîrmehê de Kongreya Jina Surayto li bajarê Qamişlo hate li dar xistin, yekemîn kongreya jinên ji gelê Sûryanî, Aşûrî, Kildanî ji bo yekkirina nêrînên xwe di dozên nasname, maf û têkoşîna jinan di nava civakê de.

Bi rêya vê konferansê jinan xwestin dengê xwe bigihînin hêzên mezin, saziyên navneteweyî, herêmî û rêxistinên mafên mirovan ku ew berpirsiyariyên xwe yên exlaqî û dîrokî li hember gelê Suryanî-Asûrî, ku bi dehan salan e ji koçberî, zilm, cudakarî, qirkirin û komkujiyan dikişîne, bi cih bînin. Herwiha denê xwe li dijî bêdengiya navdewletî bilind kirin ku hebûna wan dixe xeteriyê.

Ji aliyekî din ve ji kongireya jinên Sûryanî ji rojnameya me re li ser mijara giringiya pêkanîna sîstema nenavendîbûnê ji bo Sûriya giştî axivîn.

Berpirsa Yekîtiya Jinên Sûryan li Sûriyê Corcêt Bersomo diyar kir Sûriye di qonaxeke dîrokî de piştî hilweşandina rêjîma Baas'ê derbas dibe û wiha got: "Piştî hatina hikûmeta veguhêz li ser dashilatdariyê hêviya me ew bû ku sîstemeke ku xizmeta gel bike bê avakirin, weke sîstema ne navendî li herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyê ku mafê hemû pêkhateyên entîkî, olî û mezhebî misoger dike, lê rêya vê qûnaxê ber bi nezelalbûn û ne aramiyê ve diçe; tê xuyakirin."

**'Ezmûna Rêveberiya Xweser serkeftina pergala ne navendî teqez dike'**

Corcêt Bersomo derbarê serkeftina sîstema ne navendî di riya ezmûnên Rêveberiya Xweser wiha dewam kir: "Ezmûna Rêveberiya Xweser ku ev zêdetirî 13 salan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê herêm tê birêvebirin tecrûbeyek bêhempa ye û ji baştirîn ezmûnên ji bo avakirina Sûriyekî nû ye, dê sîstema serkeftina ne navendbûnê îsbat dike. Ev pergal amade ye û li ser xakê hatiye xebat kirin, piştgiriya gelê herêmê û navdewletî jî jê re heye. Em bi hêvî ne ku vekirin û pejirandinekî ji hêla hikumeta veguhêz hebe, ev proje destkeftiyeke ji bo şêniyên herêmê, gelek qurbanî û fedayî hatin dayîn da ku em gihaştin vê Ezmûna herî serkeftî."


**'Sîstema ne navendî herî adil e'**

Corcêt Bersomo behsa pêwistiya hebûna jinê di nava destûra nû de kir û wiha anî ziman: "Bi saya sîstema ne navendî li herêma Bakur û Rojhatê Sûriyê û avabûna Rêveberiya Xweser, pêşengtiya jinê ji vê projeyê derket pêş û li gel mêr di rêveberiyê de cihê xwe di hemû waran de girt herwiha pêşketin û gavên pir mezin da pêş, temsîla xwe di hemû waran de kir ji leşkerê, siyas, civakî û hwd.. em dixwazin ku ev tecrûbe ji bo giştî Sûriyê bibe nimûne, di nava saziyên hikumetê de cih bigre bêyî paşguhkirin û dûrxistina wê ku tenê rola wê di hin saziyan de sînordar be."

Berpirsa Yekîtiya Jinên Sûryan li Sûriyê Corcêt Bersomo di qedandina gotinên xwe de destnîşan kir ku pir zehmete piştî gav û pêşketinan vegerin xala destpêkê û wiha got: "Pir zehmete piştî van gav û pêşketinên mezin ku jinan bi îradeya xwe bidestxistin herwiha gihaştina jinan asta şehadetê di şoreşê de, da ku em bi ewle bijîn ku em vegerin gava destpêkê. Sîstema nenavendî ew Ezmûna herî adile ku mafê her kesî misoger dike û dihêle ku jin rola xwe bi hêzeke mezin bilîze di nava saziyan de.



Corcêt Bersomo



Sebah Şabo

Jina kurd, Suriyan û ereb û hwd.. li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê .. bi hev re bûn çirûsk ji bo hemû jinên cîhanê, bi hev re bi yek dengî û vînê li dijî şerê taybet ku li ser wê dihat kirin sekinî, herwiha em ji bîr nekin, xetertirîn çeteyên DAIŞ'ê ku jinan karîbû şerê wan bikin û wan bişkînin, hevkarî û peywendiyên xurt yên jinan gihaştin asta ku ew kare bi xwe bibe cihê çêkirina biryarê û mafê xwe bidest bixe."

**'Hikumeta veguhêz heman hişmendiya rêjîma Baas'ê ye'**

Endama Yekîtiya Jinên Suriyanî Sebah Şabo destnîşan kir ku hikumeta veguhêz ya ku hatiye ji bo birêvebirina kar û barê dewletê heman hişmendî û fikrê Baas'ê dimeşîne û wiha berdewam kir: "Dîsa jî pêkhateyên dîtir di nava hikumetê hatin dûrxistin û paşguh kirin ev yek di nivîsandina destûra nû de hate nîşandan, bi taybet rola jinê bi awayekî giştî ku ev yek me dît çawa tenê yek jin hate tayîn kirin di nava 23 zilaman de, ev ji mezintirîn awayê paşguhkirina jinan e."

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji 13 salan ve sîstemeke cuda tê meşandin, projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li ser bingeha Hevpeyamana Civakî hate avakirin, li ser prensîba dayîna mafê hemû pêkhateyan li herêmê, ev projeke xelaskiri ye û amade ne, piştgiriya wê dikin, em dixwazin sîstema nenavendî bê avakirin ji bo giştî Sûriyê ku her nûnerê herêmekê rêveberiya xwe bike. Eger Sûriya nû li ser rêya vê projeyê bê avakirin wê pêşerojeke serkeftî bê bidest xistin, ji ber ku projeyeke demokratîk e û beşdariyeke berfireh a pêkhateyan misoger dike. Herwiha banga azadiya mafê jinê dike ku ew jî bibe beşek di cihê çêkirina biryar de. Îro di nava Rêveberiya Xweser de bûye hevserok di saziyan û cihê rêveberiyê de û bi awayek wekhev kar û xebatan dike, ev yek wekhevî û edaletê nîşan dide."

# Îran bi cezayê darvekirinê naghêje armancên xwe

**Esma Mistefa/Qamişlo**

**Xeteriya darvekirinê li ser sê jinên Kurd; Pexşan Ezîzî, Werîşe Mûradî û Şerîfe Mihemedî rûxmî hemû helwest, kampanya û bangên navdewletî, lê hikumeta Îranê hê jî gefên darvekirinê bidawî nekiriye û di meha tîrmehê de 20 kes darvekirine.**

Her çiqas cezayê darvekirinê li gelek welatên cîhanê hatibe betalkirin jî, dîktatoriya olî ya li Îranê wê ne tenê wek cezayek dibîne; lê belê, ew weke amûrek stratejîk ji bo hebûna xwe biparêze, bikar tîne.

Hikumeta Îranê yek ji welatên herî zêde ku cezayên darvekirinê bêktîne ye. Vê yekê di bin nav, tewan, û cûcên cuda de pêk tîne. Sîstema Miletî a Îranê nefes li hemwelatî, pêkhate û gelan di Îran û Rojhilatê Kurdistanê de qutkiriye. Îran darvekirinê weke rêbaza herî normal a cezaxwarinê dibêne û dide. Li gor hişmendiya Îranê dikare bi va cezayê giran rê li pêşiya civakê, sûc, şaştî, serhildan û xwepêşandanên li hember dewletê bigre.

**Di sala 2024'an de 34 jin hatin darvekirin**

Li gorî amarên ku ji aliyê Komîteya Jinan a Konseya Berxwedana Neteweyî ya Îranê ve hatine berhevkirin, ji sala 2007'an vir ve herî kêm 263 jin li Îranê hatine darvekirin.



Di navbera salên 2013 û 2020'an de ku heyamek heşt salan e, herî kêm 120 jin li Îranê hatine darvekirin, bi kêmanî salane 15 darvekirin dihatin kirin. Lêbelê, di sala 2024'an de tenê 34 jin hatine darvekirin ku ev hejmar du qat zêde bûye.

**Pêngava Bidawîkirina Darvekirinê**

Pêngava Bidawîkirina Darvekirinê ragihand ku xeterî heye cezayê darvekirinê yên li Pexşan Ezîzî, Werîşe Mûradî û Şerîfe Mihemedî hatiye birîn, bê pêkanîn.

Pêngava Bidawîkirina Darvekirinê li ser rewşa girtiyên jin ên siyasî Pexşan Ezîzî, Werîşe Mûradî û Şerîfe Mihemedî daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de hate destnîşan kirin ku xeteriya darvekirina 15 girtiyên siyasî yên Kurd û Îranê ku herî pêşçav Pexşan Ezîzî, Werîşe Mûradî û Şerîfe Mihemedî ne heye.

Hate diyarkirin ku cezayê darvekirinê nîşaneya tirs û lewaziya dîktatoriya serdest a li hemberî serhildanên girseyî, berxwedana çalakvan û şervanên azadiyê ye û ev hatiye gotin: "Îran dixwaze bi rêya darvekirinê û serkutkirinê hebûna xwe mîsoger bike." her wiha axwaz ji saziyên navneteweyî, Neteweyên Yekbûyî û çalakvan kirin ku li dijî darvekirinê bibin xwedî helwest.

**Kampanya 'Sêşema Na ji Cazayên Darvekirinê re' Di Tîrmehê de 20 kes li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê hatine darvekirin**

Kampanyaya 'Sêşema Na ji Cezayê Darvekirinê re' ku ji hêla girtiyên siyasî yên li 38 girtîgehên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ve hatiye destpêkirin, di hefteya 79an de, daxuyaniyek belav kir. Li gorî daxuyaniyê Rejîma Îranê hefteya borî 20 kes li girtîgehên Rojhilatê Kurdistan û Îranê darve kir. Kampanyaya 'Sêşema Na ji Cezayê Darvekirinê re' ragihand ku di saleke serdema serokkomariya Mesûd Pizîşkiyan de, hejmara kesên hatine darvekirin gihişt hezar û 477 kesan. Di heman daxuyaniyê de hate gotin ku hefteya borî bi fermana berpirsê girtîgeha Qizilhesar a li bajarê Kerec ya Îranê û cîgirên wî yên bi navê Hesen Qubadî û Îsmaîl Ferec Nejad, zêdetirî 100 pasewanên çekdar yên girtîgehê û hêzên îstîxbaratê, avêtine ser hola girtiyên siyasî û çar girtiyan avêtine hûcreyên takekesî.

Kampanyaya 'Sêşema Na ji Cezayê Darvekirinê re' di dewama daxuyaniya xwe de got; "Hefteya borî cezayê darvekirinê li girtiyê siyasî Yequb Direxşan bi tometa 'propagandaya dijî dewletê' hatiye birîn. Dijî biryarê girtiyên li girtîgehên Qerçek û Tahrana Mezin nerazîbûn nîşandane û bê navber dirûşme avêtin. Serokê Dadweriya Îranê Hisên Muhsînî di daxuyaniyek çapemeniyê bi awayek eşkere ragihand ku ewê welatiyan bêdeng bikin." Kampanyayê da zanîn ku di dema şerê 12 rojan ê di navbera Îsraîl û Îranê de, zêdetirî 2 hezar kes hatine binçavkiriin. Herî dawî Kampanyaya 'Sêşema Na ji Cezayê Darvekirinê re' bang li azadîxwazan, çalakvanan, xizmên girtiyên siyasî, rêxistinên navnetewî û her kesê kir ku dijî darvekirinan dengê xwe bilind bikin.

Hêjayî gotinêye ku Kampanyaya 'Sêşema Na ji bo Cezayê Darvekirinê' di 9'ê Çileya 2023'an de wek nerazîbûna li dijî cezayê darvekirina girtiyên Rojhilatê Kurdistan û Îranê hate damezrandin. Her heftiyê roja sêşemê endamên rêxistinê dest bi greva birçîbûnê dikin.

Di dema ragihanina kampanyayê de girtiyan wiha gotin: "Ji bo ku dengê me were bihîstin, em ê her Sêşemê bikevin greva birçîbûnê. Me Sêşemê hilbijart ji ber ku ew pir caran roja dawî ya jiyana hevkarên me ye ku herî zêde ew roj dibe roja vegyheztina hucreyên yekkesî."

**Komîteya Dîtina Rastiya a Neteweyên Yekbûyî**

Hêjayî bîrxistinê ye ku di sala borî de Komîteya Dîtina Rastiyan a ser bi Neteweyên Yekbûyî (NY) der barê cezayên darvekirinê yên li Îranê de daxuyaniyek da bûn. Di wir de li ser rewşa Pexşan Ezîzî, Werîşe Mûradî û Şerîfe Mihemedî jî hat îşaretkirin ku tê de wiha gotibûn: "Werîşe Muradî piştî Pexşan Ezîzî û Şerîfe Mihemedî sêyem jine ku ji ber çalakiyên xwe cezayê darvekirinê lê hatiye birîn. Her çi qas cezayê darvekirinê yê Şerîfe Mihemedî di cotmeha 2024an de hatibe betalkirin jî, lê hîna metirsiya darvekirinê li ser heye."

Her wiha di wir de bang li Îranê hat kirin ku demildest cezayên darvekirinê bi dawî bike ku komîteyê diyar kiribû desthilata Îranê cezayê darvekirinê ji bo rûbirûbûn û bêdengkirina çalakvanên jin bi kar tîne.



# Di Edebiyatê De Jin

**Navenda Nûçeyan**

Ji destpêka mirovahiyê ve edebiyatê wekî beşek hunerî tim bi awayekî giştî civak kiriye mijara xwe ya sereke. Dema em ji vê şibakê lê meze bikin, bingeha edebiyatê mirov e. Objeya sereke ya vê hunerê rasterast mirov e. Her ku mirov e, wê demê mijar jî gelek berfireh e. Ji gelek aliyan ve rê heye ku were nirxandin. Civak yan jî yên ku civakê pêk tînin jin û mêr in. Wekî gelek mijarên sereke yên hunerî, ku di edebiyatê de jî rewşa zayendî ya civakî, li hemû dinyayê bûye mijarek girîng.

Di berhemên edebî de jî, wekî nasnameya jinê û mîsyona jinê ya ku nîvê civakê ye bi sed salan tim hatiye qalkirin. Di berhemên edebî de jin her tim bûye mijar. Gelek caran bi destê mêran mîna objeyeke zayendî hatiye bikaranîn. Vê bikaranînê rê li ber gelek nîqaş û alozîyan jî vekiriye. Bi qasî bi navê "Rexneya Femînîst" pêlekê rake nerazîbûn çêbûye.

**jinan bi navê mêran berhem çapkirin**

Heta demekê ji ber helwesta mêrane ya civakê, em karekterên ji bidin aliyekî tew nivîskarên jin jî ji ber gelek sebeban bi navê mêran an jî bi navekî anonîm berhemên ku nivîsandine dane çapkirin û belavkirin. Gelek mînakên wiha li her devera dinyayê hene. Bi taybetî di sedsala 18 û 19'an de, ji ber edebiyat di bin hukmê mêran de bû jin bi navên gelek awayan hatine çewisandin, çavtirsî bûne yan jî rê li ber wan hatiye girtin. Nivîskara navdar Virginia Wolf jî di romana xwe ya bi navê "Odeyek Ji Bo Xwe" de tim balê dikşîne ser jin û nivîskariyê. Di eynî pirtûkê de îdîakirin ku hemû navên anonîm ên nivîskarên jin in. Dibe ku ev îdîa were nîqaşkirin, lê hemû dinya bi rastîyek rê ji nîqaşê re nahêle dizane êdî. Charlotte, Emily, Anne Bronte ku xwişkên hev in û bi navên mêran (Currer, Ellis, Acton Bell) nivîs û berhem belavkirine. Berhemên xwe yên hê jî li hemû dinayê tên xwendin Jane Eyre û Girên Bi Gumînî jî bi navê mêran dane çapkirin. Mînak gelek in, pir dûr ji vê serdemê em lê mêze bikin; Nivîskara "Harry Poter" gelek ji me tenê navê wê "J.K.Rowlin" dizane. Ji ber weşangerê wê jê re dibêje; "Xortên ciwan, belkî nexwazin pirtûka nivîskarek jin bixwînin" jê dixwaze tenê tîpên pêşî yên navê xwe bikar bîne dike. Gelek mînakên bi vî rengî bi rehetî peyda dibin.

Yek ji sebeba vê a sereke jî rola jinê ku ji aliyê civaka mêrane ve hatibû diyarkirin. Jin encax di malê de, wekî jinekê bijî.

**Nasnameyeke sînorkirî**

Civakê ji huner û edebiyatê wêdetir, di jiyana rojane de cih li jinê teng kiriye, tim dîwar lêkirine û sînor jê re daniye. Norm û qeîdeyên jiyana rojane ku mêran ji bo desthilatdariya wan li ser piyan bimîne danîne, rê tim li ber jinê girtiye. Encama wê jî di huner û hemû qadên jiyanê de nasnameyek sînorkirî û çewisandî derxistine pêş.

Jinbûn û mêrbûn, ne taybetiyek ji zayînê tê, nasnameyek ji hêla civakê ve hatiye afirandin e. Civaka ku bedenê wekî zayenda jin û mêr kod dike û diafirîne, bedenê beralî dike, kontrol dike û ji nû ve diafirîne (Bayhan, 2013, rp. 147-164). Îjar hewce ye em bifikirin, civakek wilo bike, ew ê bi çavên civakeke mêrane çi nekin êdî?

Em ji kîjan hêlê ve li jiyanê binêrin, desthilatdar tim "yên din" ji nedîtî ve tên, wan kêm dikin, rê li ber wan digrin, rêka wan dirêjtir dikin û nahêlin bi temamî derkevin derî normên civakê. Ji alîyê civakê ve ev yek normalîze bûye, loma jî bi dehan nivîskarên jin serî li heman rêbazên li banî min qal kiriye dane.

Em bixwazin an nexwazin ev yek wê wekî nîqaşeke sereke der dixe pêşiya me.

Bi saya vê nîqaşê, gelek meseleyên bi vî rengî yên di qada edebiyatê de û bi saya tevgerek xurt a jinan, a femînîst êdî hîç nebe di edebiyatê de ev problem kêmtir bûye. Di metnên nivîskaran de ku çi jin çi jî mêr, li dijî hemû qeîde û pêkutiyên hişk ên baviksalarî jî rewş ber bi wekhevî yan jî hinekî demokratîze bûye êdî.

**Mînara jinên Yewnanan**

Dema em qala rola jinan an jî rewşa jinan a di edebiyatê de dikin, sedî sed ev seranserî cîhanê ye û hemû dişibin hev. Wekî mînak ku em yek bi yek li ciavaka grekiyan (yewnanan) binêrin, ku wekî civakeke pêşketî em zanin û di dîrokê de jî ev rastiyek e çi ji aliyê zanînê ve çi ji aliyê civakî ve; Lê em li destanek wan a gelekî navdar ku bi navê Odysseia de dibînin, di civakê de jin di gelek waran de wekî kesên li paş sînorekî çêkirî dijîn.

Bêguman jinên serdest li her civakê hene, di ya wan de jî. Lê ev yek rê li ber rewşa hemû jinan venake û wan dîsa li paş wan sînoran hepiskirî dihêle. Ev mînaka civaka grekiyan belkî ji bo hemû mînakeke baştir be ji bo têgihandinek dîrokî.

**Di destana gilgamêş de rola jinê**

Di ser van hemûyan re dema em bala xwe bidin serboriya jinê ya di edebiyatê de gelek çîrok û tecrubeyên bi êş dertên pêşîya me. Mînaka



herî ronî destana Gilgamêş e: Di vê destanê de, her çiqas Înnana, Stêr/Star (Îştar) wekî xwedawendan bin jî, di vê destana dîrokî/mîtolojîk de, li paş perdeyê rola jinê wekî jirêderxistina mêr hatiye diyarkirin. Gilgamêş wiha dibêje; "Tolê sîng û berê xwe vekir ji bo zewqê bide wî, ji nefesgirtina wî nereviya, keçikê cilên xwe ji xwe şeqitand, wî jî xwe li ser keçikê dirêj kir, keçikê jinbûna xwe bi wî hovî da hîskirin, êrîşa wî ya bi şewhet keçik bi mêşinî rapêça." Welhesil ji bilî vê destanê, di metnên destpêkê yên nivîskî de jî em ê lê rast werin ku jin çawa wekî objeyek, pêlîstokek cinsî û amûrek cinsî hatine bikaranîn. Gilgamêş tenê mînak e.

**Tevgera cidî ya jinê**

Di metnên îro de heger ev yek kêm bûbe, wekî li banî jî hatiye diyarkirin, bi saya tevgereke cidî ya jinan e. Ev meseleya ku hemû civakê esîr dike tim kiriye nîqaşek sereke.

Di vê atmosfera ku JIN JIYAN AZADÎ wekî mottoyeke kurdistanî li hemû dinyayê belav bûye de, belkî jî rê li ber gelek tiştên ne li rê were girtin û rêka azadiya huner û edebiyatê jî sekantir bibe.

Ji bilî van agahiyên ku li banî hatine nivîsandin, di metneke edebî de her çi qas nirxandin û rexneyên derbarê nasnameyên zayendî de bi awayekî objektîf were nivîsandin û mafê zayenda mêr û jin bi awayê xwezayî were dayîn, ew yek wê rê li ber azadiyê veke: Azadiya edebiyatê, azadiya civakê û azadîya jinê. Ev rêbaz rêbaza herî rasyonel a civakî ye di eynî demê de.

## Cejna Vejînê



Remezan Olçen

Dema ku bi Lozanê Kurd û Kurdistan hatin parçekirin û bêstatu hat hiştin, ji bo Kurdan ji sedsalên bihurî dijwartir sedsaleke xwînî jî dest pê kir. Serkêşiya vê siyaseta înkar û îmhayê jî Komara Tirk kir. Komara Tirk ji dema hatiye damezrandin û vir ve weke aşekî netewe û etnîteyan, bîr û bawerî hêraye. Ev çîrokeke bi êş e û gelê Kurd bi rastiya vê çîrokê heta hestiyên xwe hesiyaye. Serokê partiya faşîst Alparslan Turkeş di bernameyeke televîzyona dewletê de li hemberî gotina; Tirkiye mozayîk e derdiket. Wî digot; Na, Tirkiye weke mermerê ye yekpare ye. Ev zîhniyeta tekperest ku îro roj jî li ser postê desthilatê rûniştiye, lê di encama têkoşîna Apoyî ev zîhniyet êdî nikare bibêje 'yekpare mermer e' êdî behsa Tifaqa Kurd û Tirk dike. Behsa tifaqa gelan dike. Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û bi deh hezaran şehîdên dozê hebûna Kurd îspat kirin.

Îro roj êdî kes nikare înkar bike; heke ku rabûna Rêber Apo nebûna, heke Tevgera Azadiya Kurdistan nebûna wê hîn di salên 1970-80'yî de qirkirina neteweya kurd temam bikirana. Kurdan wê xwe înkar bikirana û wê gotina; "Em tirkên çiyayî ne, dema zivistanan em li ser berfê meşiyan û dengên qert û qurt ji bin nigê me derketiye ji lewma ji me re dibêjin kurd." Û wê çîrok biqediya. Lê bi rabûna Rêber Apo. Bi fehm û feraseta wî hem li zindana Amedê hem li çiyayên Kurdistanê li dijî vê meşa dîroka serdest a bêbext Kurdan li rastî û heqîqeta xwe vegeriyan.

Tevgera Azadiya Kurdistanê PKK'ê li dijî siyaseta qirker a dewleta Tirk a mêtinger û qirker şerê çekdarî yê domdirêj da destpêkirin. "Fîşeka Yekem" di 15'ê Tebaxa 1984'an de li Dihê û Şemzînanê hat teqandin. Ew fîşek bi xwe re gelê Kurd hişyar kir. Ew gelê ku li ber çerxa qirkirina her cureyî bû, ji bo rizgariya xwe şerê hebûnê da destpêkirin. Şerê PKK'ê bi xwe re hiqûqa ji bo kurdan anî. Navê Kurd û Kurdistanê bû kirdeya siyastê. Vê siyasetê daw û doza xwe, nav û nasnama xwe, çand û zimanê xwe û welatê xwe yê azad kir û hej dike. Fîşeka Yekem bi referansa ku ez ê ji Frantz Fanon bigirim û li ser qewlê Jean Paul Sartre; bi fîşekekê hem serdest û hem jî bindest ji hole rakir. Gotineke di nav gelê kurd de heye, dibêje; mirî bi xwe nizane ku miriye. Lê dema millet ji ser gora wî belav dibe, ew jî dike bide dû wan û rabe biçe. Lê sere wî li kevirê qebrê dikeve. Hingê dizane û dibêje; wey li min ê mirî ez bûm. Bindest bi saya Fîşeka Yekem bi xwe hesiya, sere wî li kevirê hedê/qebrê ket. Qonaxa jiyanê jî wisa weke rewşeke paradoks ji vê derê derket û geş bû. Şer li Kurdistanê bû navê jiyanê, bû nave azadiyê.

Kurd ev 41 sal in bê rawestan ku di dîroka nêz a Kurdistanê de rabûneke wisa û domdar tine, di oxira azadiyê de şer dikin. Bedêlan didin lê meşa xwe ya ber bi azadiyê ve nasekinînin. Ev bi xwe re hemû hevsengiyên li ser tinebûn, înkar, pişaftin, qirkirinê guhert. Di encama têkoşîna 41 salan de kurdan fikr û felsefeyeke nû pêşkêşî cîhan û mirovahiyê kir. Felsefeya Jin Jiyan Azadî êdî bûye pusulaya jiyana nû. Çawa ku dirûşma Azadî, xwişk/biratî û wekhevî 250 salan, bû pusulayan têkoşîna ji do azadî û demokrasiyê, ji bo edaletê îro roj Jin Jiyan Azadî heyecaneke wisa çêkiriye û bûye pusule ji mirovahiyê re. Di sala 42'yan de Pêngava 15'ê Tebaxê Cejna Vejînê fikr û felsefeya Aştî û Civaka Demokratîk li pusulaya Jin Jiyan Azadî jî hembêz dike û li Rojhilata Navîn derî li ronesanseke mezin li vejîneke mezin vedike. Bi saya ked û xebata Rêber Apo û şehîdan ev gel Cejna Vejînê îro roj hîn bi coştir pîroz dike û heqîqeta xwe tê de dibîne. Cejna Vejînê pîroz be.

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 3 cihên şûnwariyê...(3)

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê; Nebî Hûrî, Girê Mozan û Keleha Sukera ye.**

**Nebî Hûrî**

Ew bi navê bajarê Korş tê naskirin. Bi dûrahiya 45 kîlo mitreyan dikeve bakur û rojhilatê bajrê Efrînê. Ew ji Helebê 70 kîlo mitreyan dûr e. Çemê Sabûnê di rojhilatê wê re derbas dibe û li wî cihî keleha Nebî Hûrî cih digire. Ev cihê Şûnwarî xwedan çend navan e weke Nebî Hûrî yan jî Keleha Nebî Hûrî, lê navê vî bajarî yê Yûnanî Siros e. Bi navê bajarê Elqidîsîn Kozma û Dîmanos dihat naskirin (Îciyabolis). Li dora gora wan dêrek hat avakirin.




Dêr bi destê Semian Elxeyûr hat avakirin û tê de jiyana xwe ji dest daye.

**Girê Mozan:**

Ew cihekî şûnwarî yê nêzî bajarê Amûdê ye. Ew navê bajarê Orkêş ê niha ye. Orkêş di dawiya sedsala sêyem û destpêka sedsala duyem a berî zayînê de geş bûbû. Ev gir li başûrê rojhilatê bajarê Amûdê ye. Ew bi qasî 100 kîlo mitreyan dûrî bajarê Hesekê ye. Di sala 3500'î yê berî zayînê de Orkêş navendeke olî ya mezin bû û tê de dika perestgehekê hebû ku 20 mitr ji deştê bilindtir bû. Di sala 2500'î de Tilberek (Naxara kevin) jî navendeke olî ya girîng bû. Dika koşka Orkêş a mezin li gel dîwarê bajêr ê mezin li ser dika kevin avakirî bû. Vî dîwarî 130 hektar dorpêç kiribû. Di wê demê de Girê Merdîx (Eblaya kevin) gihaştibû lutkeya hêza xwe.

**Keleha Sokera**

Dikeve başûrê rojavayê Hesekê û bi qaşî 35 kîlo metreyan dûrî Hesekê ye, li ser çiyayê Ebdulezîz dikeve. Keleha li ser heye, yek ji rêzeçiyayên bilind ê Çiyayê Ebdulezîz e û di riya Hesekê-Muxlûce re mirov digihêje wê deverê. Li kêleka gir bermahiyên vê kelehê li ser hene.

# Bi desteka şaredariyê û gel wê çanda paqijiyê pêşbikeve

**Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Dêrikê Ciwan Hesen diyar kir ku şaredarî her tim di nav kar û xebatê de ye, lê pêwîstî heye ku gel jî bi erkê xwe rabe û destekê bide karmendên şaredariyê.**

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Şaredariya Gel a bajarê Dêrikê rojane di nav kar û xebatê deye û hemû hewildanên xwe dike ku pirojeyên sala 2025'an pêk bîne û pirsgirêkên heyî hemûyan çareser bike. Niha jî him kolanên bajêr têne zifit kirin, him jî xetên avê ji taxên pêwîst re têne çêkirin, herwiha kar û xebatên firehkirina taxa Cûdî tê kirin.

Di derbarê kar û xebatên Şaredariyê û pêkanîna pirojeyan hevserokê şaredariya gel a bajarê Dêrikê Ciwan Hesen ji Rojnameya me re axivî.

**'Çareserkirina pirsgirêkên xizmetguzarî erkê şaredariyê ye'**

Ciwan Hesen da zanîn Şaredarî salane pirojeyên nû datîne pêşiya xwe û wiha got:" Di derbarê pirojeyên me yên sala 2025'an ên mûwazenê bi destekdanyîna kampaniyan pêk tên. Ev piroje li ser çar beşan hatin belavkirin, pirojeya me ya kenelisyonê ji bo taxa şehîd Xebat û li hin taxên din yên pêwîst, me li gor wê pirojeyên xwe ragihandine û me dest bi kar kiriye. Di heman demê de pirojeya ronîkirina riyên sereke yên çûn û hatinê di bajar de û di bazara bajar de jî niha dest pê kiriye. Pireke Bîtonî li pişt nexweşxaneya bajar ew jî niha hatiye dest pê kirin. Her wiha pirojeyên zivtikirinê jî hene, ev piroje li ser sê qonaxan dabeş kirî ye qonaxa yekê 10 hezar m2 li riyên cûn û hatinê di bajar de bidawîbû, ji bo qonaxa duyem wê nêzî 20 rojên din dest pê bike ji ber ku kampaniya Cûdî niha



bajarê Çil axa, Tilkoçer û Girkê legê çêdike, piştî bidawîbûna van cihan wê dest bi bajarê Dêrikê bikin. Qonaxa sêyem jî wek her sal binavê karê civakî tê naskirin, hîn diyar nebûye ku wê çiqas zift pêwîst be ji me re, ji ber ku heya niha jî gel daxwazên xwe dighînin me ji bona pirsgirêkên ku li taxên wan têne jiyan kirin."

**'Şaredarî her di nav bername û pirojeyên nû de ye'**

Hesen diyar kir ku hin pirojeyên heyî yên şaredariyê bixwene û ew li gorî derfetên xwe pêk tînin û wiha got: "Pirojeyên me yên giring hebûn, ev yek bi biryarên Meclisa Şaredariyê ve girêdayîne, armanca bingehîn têde çareseriya pirisgirêkane, yek ji wan taxa Cûdî ku bi taxa xêrikan tên naskirin, ji nûve bi rêxistinkirina wê taxê. Di heman demê de derxistina xanên sewalan ji nav wê taxê da ku tax were rêxistin kirin. Dema ev tax were bi rêxistin kirin wê ji nûve xetên avê werin çêkirin, kenelisyon jî ji bo taxê werin danîn û wê li ser qonaxan tax were zifitkirin. Ev 15 rojên ev piroje dest pê kiriye û tax tê rêxistin kirin, ji niha heya serê mehê wê bidawî bibe û em ê dest bi sererastkirina taxê bikin."



Hesen axaftinên xwe domand û wiha got: "Ji bo paqijkirinê me hin alav kirîn, bi taybet melkesê otomatîk ji ber ku di bajar de bernameye paqijiyê hatiye danîn û di heftiyê de carekî riyên sereke û bazar tê melkes kirin û di mehê carekî hemû tax tên melkes kirin. Di heman demê de beşê ekolojî sê parik wek istismar dane, parka Jîn jî hazirî têde tên kirin da ku were vekirin. Hin pirojeyên kevirê hûr li pêşiya me heye û tê pêkanîn, riya ku ji geracê diçe heye nexweşxanê hat sererast kirin, riya ku diçe qada cejna Newrozê niha kevirê hûr jêre tê danîn da ku sala bê were zifitkirin. Şaredarî her di nav bername û pirojeyên nû de ye. Di heman demê de heftiya bê civîna me ya nîva salê de em ê ji gelê xwe re karê ku hatî kirin û pilanzasiyên ku wê di dema pêş de jî werin meşandin vebêjin. Herwiha em ê li gel jî guhdar bikin ka çi rexne û nêrînên wan hene, da ku karê me deha serkeftî derbas bibe û sala 2025'an bibe saleke dagirtî kar û xebatên bi encam û serkeftî."

**Astengiyên li pêşiya kar û xebatên şaredariyê**

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Dêrikê Ciwan Hesen axaftina xwe bidawî kir û wiha got: "Tevî ku derfetên di destên me de kêmin jî, lê tevî wila jî em hewil didin bi van derfetan xizmeta gelê xwe bikin. Astengiyên ku derdikeve pêşiya me di milê serifkirina ava zêde di bajar de ye. Ji ber ku dabînkirina avê ji bajarê Dêrikê re û di demsala havînê ya germ de heyanî astekî zor û zehmet e. Lê tevî wiha jî me karî ku em vê pirsgirêkê çareser bikin û rê nedin ku mîna deverên din ku pirsgirêkên kêmbûna avê dereng bikevin. Lê li beramberî vê yekê beşek ji civakê bi me re nabe alîkar di vî warî de û di heman demê de gel ji bona paqijkirina nava bajêr û li ber mala xwe pir nealîkare û çanda paqijiyê jî di nava gel de lawaze. Ji ber vê yekê heger gel û şaredarî bi hev re nebin alîkar, çiqasî karmendên paqijiyê hebin jî têra paqijiya nava bajar nakin. Hêviya me ewe ku gelê me jî destekê bide me da ku bajarê me her tim pajiq û xweşikbe."

# Kişka Ronahî.. Pira raghandin û zanînê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Kişka Ronahî ya belavkariya rojnameyan weke xaleke hevdîtina rasterast di navbera raghandin û civakê de ye, herwiha ew derfeteke ji bo nasîna bûyer, geşdanên siyasî û çandî ye di heman demê de platformeke ji bo beşdariya civakê di raya giştî de ye.**

Li nêzî çerxerêya Osman Sebrî ya bajarê Qamişlo kişeke biçûk bala mirov dikşîne, tê de rojname û pirtûkên siyasî û çandî têne firotin bi armanca belavkirina çanda xwendinê di nava civakê de ku bi taybet kategoriya ciwanan hedef digre. Mîna vê kişkê li hemû herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene weke hewildaneke herêmî ji bo belavkirina zanistê û şopandina bûyeran, xwendevanên rojnameyan rojane ji bo naskirina guhertinên li ser rûyê vê erdnîgariyê çêdibin berê xwe didin kişkê weke ciheke baweriyê ji wan re hatiye tesbît kirin.

Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê ku ji bajarê Kobanê sala 2012'an dest pê kir, preojeyeke demokratîk li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate avakirin û damezirandina Rêveberiya Xweser berhmek ji têkoşîna gelê herêmê hate nîşandan, ku armanca wê avakirina civakeke azad e û civak xwe bi xwe rêve bibe. Di nava vê şoreşê de pêwistiya dengê raghandinê hebû ku dengê şoreşê derxîne cîhanê û guhertinên civakî û siyasî belge bike herwiha çanda pirrengî û hevjiyana azad xurt bike. Gelek saziyên raghandinê hatin avakirin di nav de Saziya Ronahî ya Belavkariyê ku berhemên saziyên din weke rojname, kovar û pirtûkan pêşandan dike di riya avakirina kişkan de.

**Kişk bûye qadeke zanînê**

Saziya Ronahî ya Belavkariyê kişkên firotina pirtûk û rojnameyan avakir li piraniya bajaran weke Qamişlo, Amûdê, Hesekê, Tirbespiyê, Rimêlan, Dêrikê û Kobanê.

Di van kişkan de jin û mêr tê de xebat dikin, çaxê sibeha dewameke û piştî nîvro dewameke din e, tê de pirtûkên çandî, siyasî, rojname û kovar herwiha pêwistiyên dibistanê têne firotin. Herwiha ew bûye weke qadek ji bo naskirina pêşketin û geşdanên siyasî û guhertinên ku di seranserî Sûriyê de çêdibin.

**Tevî alternatîfên nû rojname hîn jî diaxivin**

Derbarê vê mijarê xebatkara di kişka belavkariyê de kar dike Hemrîn Osman ji me re axivî û wiha got: "Gelek xwendevanên rojnameyan serdana



kişka me dikin û pirsa hejmarên nû dikin. Herî zêde kesên bi temen mezin tên ji bo kirîna rojnameyan ji ber ku hîn çanda xwendinê ya kevin bi wan re heye, rêjeya xwendina ciwanan jî başe lê ne zêde ye, belê ji ber ku piraniya ciwana di serdema nû de berê xwe didin medya dîcîtal. Gelek kesên ku serdana kişkê dikin ji bo rojnameyan caranan li me vedgerin û pirsa hin gotar an jî mijarên di nava rojnameyên dikin. Bi rastî ev yek kêfxweşiyê bi me re çêdike ji ber ku tê nîşan ku hîn jî kes hene girêdana wan bi xwendinê re heye. Di kişkê de rojnameyên Serxwebûn, Rojava, Ronahi û Sûrî tên pêşandan. "

## Mucîzeya Fîşeka 15 Tebaxê



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Sala 1984'an li Bakurê Kurdistanê li ser gelê Kurd xaka mirinê hatibû reşandin.

Bê destûra dewleta Tirk, li Bakurê Kurdistanê pelê darê nediweşiya! Dewletê karîbû bi du cendermêyên xwe, navçeyek birêve bibira.

Dewleta Tirk weke desthelatdar li ser her herêma Kurdistanê bi cîh bibû. Ne tenê li ser erdnîgariya Kurdistanê, xwe li ser mêjiyê her Kurdekî cîbicîh kiribû. Li gor dewletê Kurd tenê ji bo xizmet û leşkeriyê amade bûn. Kurd tune ye, Tirkê çiyayî ye. Belengaz e, nezan e, hêjar e, hov e û hemal e.

Kurd ji bo pariyekî nan bidest bixe, bixwîne, divê berê berê bibe Tirk û piştre karibe bijî.

Kurdekî ji bo debara xwe bike û gepke nan peyda bike, divê berê xwe bide Istanbol, Bûrsa û Îzmîrê. Ji bo li van bajaran karekî peyda bike, divê destpêkê Tirkî fêr bibe, piştre ji Kurdîtiyê û ji xwe bireve. Kesê biçe dibistanên wan divê berê bibe Tirk xwe înkar bike, da ku karibe xwendina xwe temem bike.

Li Bakurê Kurdîstanê, kesên dewlemend, xwedan qîmet parlementer, şaredar ya kesên hevkarê dewletê bûn, yan jî Tirkên Îzmîrê, Enqerê, Trabzonê ser navê bajarên Kurdan dibûn parlementer û di lîsteyên partiyan de dihatine nivîsandin. Û ew kesayet dibûn parlementrê bajarên Bakûrê Kurdîstanê. Li ba Kurdan jî Kurdistan û Kurdayetî hatibû tunekirin. Ji bo Kurd hemû karibin weke mirovan jiyanê berdewam bikin, divê despêkê bibin Tirk, milletê xwe biçûk û kêm bibînin, ji dê û bavên xwe jî şermê bikin, ji xwe û kesayet xwe jî birevin.

Li asîmana Xwedê xwedan gotinê bû, li rûyê erdê jî, dewlet xwedan gotinê bû. Her kesayetekî Kurd di mêjiyên xwe de bi hezaran qereqolên tirsa ji dewletê ava kiribû. Dewletê bixwe bawer digot; me bernameya Tirkbûnê temam kir û Kurd dawî lê hat.

Ji vir 41 sal berê, bizava netewî fîşeka destpêkê di 15 Tebaxê de teqand. Ev fîşek bû mucîzeyek û li çar hêlê Kurdistanê geriya. Di destpêkê de mêjiyê Kurd ê tevizandî de teqiya û dîwarên tirsa mêjî û dilê Kurd, bela wela kir. Lewre armanca wê fîşekê ne kuştina leşkerekî bû, armanca wê fîşekê, têkbirina tirsa dewletê ya bi darê zorê ava kiribû. Ev fîşeka han bû mucîzeyek û li çar hêlê welatê me de deng da, bû cesaret û camêrî ji bo gel, bû tirs û têkçun ji bo dewletê.

Bû tovê Kurdê azad û tirsa Kurdê xwe firoş. Dengê vê fîşekê bû şîyariya Kurdê xewkirî, jiyana nû ji bo Kurdê mirî, herçû ev deng bû banga serxwebûn û azadiyê.

Kurdê tirsonek bû egîd û qehreman, Kurdê nezan bû jîr û zana. Di vê 41 salî de ev fîşek bû mucîze û Kurd kir pêşengê Rojhelata Navîn. Ji bo neyaran jî ev fîşek bû, tirs têkçûn û rizandin. Belê ev fîşek bû mucîze, milletêkî ji tunnebunê, kire pêşengê azadiyê.

Dewleta ku digot li beramber min kes nikare li piya bimîne, neha li pêşberî zarokekî Kurd,ev dewlet bi tanq, top û balafirên cengê tevdigere. Mucîza fîşekê divê neha vegere mucîzeya sîyasî, civakî û aborî. Ger em Kurd, di dema pêşde karibin weke fîşekên 15 Tebaxê mucîzeyan pêşbixin, divê em pêşengîya sîyasî, civakî, zanistî û aborî zutirîn dem pêk bînin. Vê mucîzê, Kurd bi cîhanê da nasandin, mucîzeya duyem li benda me ye.



# Sîstema herî guncav ji bo siberoja Sûriyê nenavendiya siyasî ye

**Berpirsê Beşê Peywendiyan yê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk D. Luqman Ebdullah diyar kir ku sîstema navendî ji bo Sûriyê nabe, Sûriyê ji gelek netewan pêk tê û ev sîstem demokrasiyê nagire nav xwe; ji bo wê sîstema nenavendîbûna siyasî sîstema herî guncave ku pirsgirêkên Sûriyê pê çareser bibin.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê nenavendîbûna îdarî û nenavendîbûna siyasî, Berpirsê Beşê Peywendiyan yê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk Bijîşk Luqman Ebdullah bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Sîstemên bi dirêjiya dîrokê li Sûriyê hatine meşandin çine?**

Di sala 1920'an de, dema ku Sûriyê hate avakirin ne bi rengê sistemê dewletê bû, û sînorên wê nehatibûn destnîşankirin. Lê piştî 1920'an dewleta Sûriyê di bin serweriya intîdaba Ferensayê de hat avakirin û bi sistemekê navendî hate birêve birin. Gelek mijar ji bo Sûriyê dihatin gotin wek nenavendî û hwd…lê sîstema Sûriyê bû navendî. Hikumê Sûriyê heta salên 1960'î de jî hukmekî gelerî û perlemanî bû ku desthilatdariya serokkomar ewqasî lê nebû. Herwiha tevî ku navendî bû jî, lê asoyên demokrasiyê tê de dihat meşandin, destûra wê jî destûreke baş bû, ji ber gelek xal di nava xwe de digirt mîna nenavendiya herêmî. Piştî serxwebûnê di sala 47'an de Sûriyê ji bin serweriya intîdaba Ferensayê rizgarbû.

Ji bo wê gelek serok hatin ser desthilatdariyê. Di wê demê de jî veguhestina desthilatdariyê baş bû, lewma ew dihat erêkirin; gelek serokên Sûriyê hatin guhertin, piraniya wan Kurd bûn. Sistemê ku li Sûriyê di wê demê de dihate meşandin bi gel re her tim danûstandiandebû û vîna gel li ber çav digirt. Lê piştî ku rejîma Baas hat ser desthilatdariyê di salên 60 û 63'an de, wê demê Sûriyê kete nava sistemekê navendî û teng de ku demokrasî û azadî bi carekê li holê nema. Angu giranî bi şêwazekî ewlehî û siyasî sistem bi rêve dihate meşandin. Bi ketina rejîma Baas di 8'ê Kanûna 2024'an de li ser destê hikumeta veguhêz a niha li Şamê serweriya xwe dide meşandin, li holê tu sistemekê xuya nake, lê hikumeta Sûriyê ya veguhêz dixwaze bi rengekî navendî Sûriyê bi rêve bibe.

**Sîstem bixwe tê çi wateyê û çi cudahî di navbera desthilatdarî û rêveberiyê de heye?**



Sîstem; ew rêya ku karûbarê her welat û dewleteke pê tê meşandin, di heman demê de mekanîzma ku karê gel di sînorekî diyarkirî de tê meşandin, jê re sîstem tê gotin. Herwiha sîstem awayên xwe jî hene ku ji wan sîstemên qiralî, navendî û nenavendî ne. Sîstem jî li gorî destûrekî tê nivîsandin, ji bo wê dema cihê em behsê dikin dewlet an qiralî be, gelên wê li hev dicivin û destûrekî dinivsînin, ew destûr jî li gorî pîvanên navnetewî yên ku mirov pê jiyan dikin wekî aborî, siyasî, leşkerî û hwd… danasî dike û li ser rûyê erdê pêk tîne.

Cudahî di navbera desthilatdarî û rêveberiyê de heye. Desthilatdarî ji dema Someran û heya niha li ser civakê hatiye ferzikirin û kesên ku berjewendiyên xwe yên şexsî bikar tînin ew desthilatdarî ne, ev heya derketina netew-dewletê jî heye. Ji ber netewdewlet bixwe jî berdewamiya vê yekê bû. Lê rêvebirina îdarî ew îdariya xwezayî ye ku civak bixwe xwe ava dike û birêve dibe.

**Sîstema navendî û nenavendî çi ye û kîjan ji van sîsteman demokrasiyê di nava xwe de dihewîne?**

Sîstema navendî; şêwazê kar û xebata wê ji yek navendê tê bi rêve birin, biryar û zagon ji yek navendê têne standin. Di hindirê sistemê navendî de nabe çi alî, beş an jî herêm bi serê xwe biryareke biçûk an mezin, çi civakî, siyasî, aborî û leşerî be, bide. Tenê biryar wê ji navendê bê derxistin û belavkirin, her kes jî pêwîste ku pêkbîne. Ev jî li gorî destûr tê birêve birin, ez bawernakim gelekî ku destûrê xwe baş fêm bike, were sîstemeke navendî ji xwe re deyîn û li gorî wê xwe bixwe têxe nava zindanê de. Ji ber dema navendîbûn tê gotin, demokrasî li holê namîne û tenê desthilatdarî serwerdibe.

Sîstema nenavendî bi xwe jî rengê



xwe hene, wekî nenavendîbûna îdarî û nenavendîbûna siyasî. Nenavendî ew e ku biryar, kar û siyaste hemû ne ji navendekê tenê derdikeve, lê bi rengekî hemahengî ji gelek navendan û bi rengekî hevbeş ku hevdû temam bike derdikeve. Dema em dibêjin nenavendî nayê wateya ku navend tune, lê ew navend ne serwer û desthilatdar e, her herêm û kantonek dikare biryara xwe bistîne, lê hemahengiya wan bi navendê re heye. Mînaka vê yekê jî niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin ku sîstema wê nenavendî ye, lê navenda wê heye, lê her kantonek li gorî rewş, erdnîgarî û pêkhateyên xwe, karê xwe dike û biryarên xwe derdixin û jiyana xwe birêve dibin.

**Cudahiya di navbera nenavendiya îdarî û nenavendîbûna siyasî de?**

Dema em dibêjin nenavendiya îdarî bêtir îdara herêmî ye. Berê jî di destûra Sûriyê de îdarî hebû, mînak hevserokê şaredariyê ji herêmê bi xwe bû û biryar bixwe derdixistin, lê dîsa jî girêdayî navendê bû, ji ber ne darayiya wê û ne biryarê wê serbixwe ye. Lê dema em bêjin nenavendiya siyasî ew rengek ji rengê fedraliyê ye. Jixwe ferdralî û konfedralî heye, dema gelek fedraliyat bi hev re hemahengiyê dikin, em jêre dibêjin konferdarlî ku ne cihek û erdnîgeriyek tenê ye, lê gelek in. Fedralî bixwe jî sîstemeke nenavendî ye bêtirî xwe nenavedîbûna siyasî ye. Cihê ku nenavendîbûna siyasî tê de hebe, ew cih dikare biryara xwe bistîne, mînak dikare hevpeymanekê bi hêzê in din re çi di hundir an derve de be, yan herêmî û nenavendîbî bin jî pêk bîne û biryarên siyasî dikare bistîne, wê demê heta beşê parastin, darayî û derve tê de hene. Sîstema Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî nimûna herî berbiçave ji bo nenavendîbûna siyasî ye ku her kantonek karê xwe yê leşkerî, aborî û civakî dike, ev hemû jî dikeve bin çarçoveya sîstema nenavendîbûna siyasî de.

**Sîstema herî guncaw ji bo siberoja Sûriyê pêwîste çi sistem be?**

Di rewşa Sûriyê ya niha de sîstema navendî wê gelekî şaş be, ji ber Sûriyê ne ji netewekî tenê pêk tê, lê pir netew di Sûriyê de hene mîna Kurd, Ereb, Ermen, Xiristiyan, Çerkez, Turkmen û hwd… hemû jî ji netewên Sûriyê yên resen in. Lê kiryarê ku di Sûriyê de çêbûn û heya niha piştî hikumeta veguhêz jî nêzîkîbûna wê ji jiyana siyasî û civakê re, nêzîkatiyên desthilatdariyê ye ku dixwaze yekalîbûnê bide meşandin, lewma jî vê hikumetê meclis ava kir ku hemû kesên di meclisê de yên girêdayî wane, hem jî ragihandina destûrekî kir ku wan bi xwe nivîsandibû û li gel venegeriyan, bi van hewildanên xwe yên yek anî tu pîvan ji azadî û demorasiyê re nehiştin.

Ji bo wê sîstema nenavendîbûna siyasî ya herî guncawe ku pirsgirêkên Sûriyê pê çareser bibin. Ev sîstem tenê dikare vê rewşa niha ku bi dehê salan tê jiyankirin û hatiye komkirin heta ku gihaye vê encamê çareser bike. Ji ber bi sîstema niha ya ku li Sûriyê tê meşandin û bê ku vîn û hebûna pêkhateyên heyî li ber çavan were girtin, wê tu çareserî pêkneyê. Ji bona siberoja Sûriyê pêwîste gelê Sûriyê tev biryara xwe bixwe bistînin û bi rengekî aktîf cihê xwe di avakirina Sûriyê de bigre.

Mînak Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji gelek pêkhateyan pêk tê, ji bo wê tu nikarî sîstemekî li ser wan feriz bike ku ne sîstemeke pirrengî be, lê divê sîstemekî ku gel pêş bixe, nimûneya wê jî li pêşiya çavê me ji sala 2012'an ve û heta niha. Herwiha di sala 2014'an de dema ku Rêveberiya Xweser hat avakirin û herêma herî bi ewle ku tevî ewqas şer, êriş û di nav de jî şerê taybet li ser tê meşandin ev herême. Sîstema nenavendî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû nimûne ji Sûriyê û Rojhilata Navîn re û bû sîstema herî guncaw ya ku tê qebûlkirin ji aliyê civakî, aborî, siyasî û hwd… ve.

# ‘QSD’ê bûya hêviya tevahî pêkhateyên Sûriyê’

**Rêveberê Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku di demekê de ku nîvê xaka Sûriyê hatibû dagirkirin û gelên herêmê di bin gefên êrişan de bûn damezrandina QSD'ê bû hêviyeke mezin, QSD'ê serketinên mezin bi dest xistin û bi van serkeftinan bala cîhanê tevî kişand.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di demeke ku komên çete yên mîna DAIŞ, El Nusra û gelek komên din bi piştgiriya dewletên mîna Tirkiyê êrîşî Sûriyê dikirin, Hêzên Sûriya Demokratîk li ser bingeha parastina xak û gelên Sûriyê ava bû. Di nava 10 salan ji têkoşîneke bê hehmpa de, QSD’ê dikarîbû bibe hêza parastina gelên Sûriyê û ji tevahî cîhanê re bû mînak.

Derbarê mijarê de Rêveberê Meclisa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox ji rojnameya me re axivî.

Mehmûd Qeremox di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Damezrandina QSD`ê ne bi awayekî hesan û normal bû, lê belê di nava şert û mercên pir girand de hat avakirin. Di wê demê de gelek êriş û tevlîhevî di giştî herêmê de hebûn. Bi taybet êrişên çeteyên DAIŞ’ê ku bi dilekî sar mirov şerjêdikirin, jin direvandin û difirotin û komkujî di derheqê gelên herêmê de pêk tanîn. Ne tenê di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xeterî û metirsiya çeteyên DAIŞ`ê çêbû, lê xeteriya wan li ser Rojhilata Navî û tevahî cîhanê hebû. Li herêmê roj bi roj tevlîhevî zêdetir dibû. Di bin navê îslamî de çeteyan komkujî pêk tanîn, dixwestin ku her kesî bikin bin kontrola xwe de. Bi vî rengî dixwestin herêmê dagir bikin û gel bikin koleyê xwe.



Ji ber vê yekê pêkhateyên herêmê nikarîbûn vê zehniyeta reş qebûl bikin û li hemberî wê derketin. Yê ku li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kirin û li Kobanê çete têk birin, şervanên YPG_YPJ`ê bûn, li kêleka YPG û YPJ`ê jî gel hebû ku her kes piştgiriyê dide zarokên xwe yên di çeperên şer de. Li ser vê esasê me hevgirtina pêkhateyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dît, Lewma Hêza Sûriya Demokiratîk QSD`ê hat avakirin ku hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê cihê xwe di nav de bigrin.”

**‘Bi alîkariya gel QSD`ê gihiştiye vê hêza bilind’**

Mehmûd diyar kir ku QSD`ê li ser esasê parastina mafê gelan hat avakirin û wiha pêde çû: “Ji ber êrişên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pêwîstî bi avakirina QSD`ê çêbû. Ev yek jî li ser daxwaza gelên herêmê hat kirin. Dema ku DAIŞ’ê êrişî gelê Kobanê û Sirînê kirin, gel bang li QSD`ê kirin ku werin wan ji nav destê van çeteyan xilsa bikin. Îro bi şervanên QSD’ê, DAIŞ li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate tunekirin. Bêguman hêzên QSD`ê li ser bingeha berxwedanî û parastina mafê gelan hatiye avakirin, ew bûye hêviya herî mezin ji tevahî gelên herêmê re. Dema ku gelek bajar û bajarok ji aliyê QSD’ê ve hatin rizgarkirin me xwest ku gel bi baweriyeke mezin xwe bi xwe rêve bibe. Ji ber vê yekê piştî demekê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hat avakirin. Di vê rêveberiyê de tevahî pêkhateyan cihê girtin. Bi alîkariya gel QSD`ê gihiştiye vê hêza bilind.”

**‘Tirkiyê hewl da ku QSD`ê tune bike’**

Qeremox di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Hêzên QSD`ê di bingeh de pir zehmetî kişandin, ji ber ku li hemberî komên çete yê herî xeter serî hildan û jiyanek nû ji bo tevahî gelên Sûriyê dan avakirin. Ji ber vê jî bi hemû hewldanên xwe xwest ku xwe fedayî gel û welatê xwe bike. Bingeha QSD`ê ne hindike lê belê pir kûr û xurte, ji ber di nava xwe de cihê her pêkhateyekê çêkir. Niha jî têkiliyên QSD`ê bi desthiladariya Şamê re li ser vê bingehê ye ku mafê her netewekî were parastin û Sûriyeke ne nenavendî were avakirin. Dewletên hegemon ên wek Tirkiyê ku destekdayîna çeteyên DAIŞ`ê dikirin, di heman demê de gel bi destê wan dihat qetilkirin. Ev dewletên bi vî rengî ti carî pêş nakevin û aştiyê di welatê xwe de jî nabînin. Hemû hewildanên Tirkyê jî tenê ji bo ku pirojeya Rêveberiya Xweser bişkîne. Ev 400 sal e ku xewina Osmaniyan dagirkirin û talankirina gelan bû. Her tim xwstin ku gelê Kurd tune bikin û wan bixin bin kontrola xwe de. Lê ji ber ku QSD`ê yekemîn hêz bû li Sûriyê li hember vê desthiladariyê û zihniyetê derket û şer kir, ev yek ji desthetdaran re giran tê û ne qebûlkirin çêdibe, Tirkiyê jî her diçe dixwaze pirojeya QSD`ê têk bibe. Di asta yekemîn de yê ku Sûriya xirab û talan kir Tirkiya bû, ne rêjîma Baas bû. Ji destpêka Şoreşê û heya roja me ya îro jî Tirkiyê dijminatîya Kurdan dike û û naxwaze ku Kurd bi mafê xwe bang bikin. Di heman demê de wê gelek piroje ji bo tunekirina Kurdan pêk anîne. Lê heya vê rojê jî ti pirojeyên wê li hember QSD`ê bi ser neket. Em heta dawiyê jî li ser fikir û felsefeya Rêber Apo jiyan dikin û her serkeftinên me bi saya Rêber Abdullha Ocalan e. Zilim û zordariya ku Sîstema Baasê li ser Sûriyê dimeşand û bi taybet li ser Gelê Kurd dihat meşandin, bi saya QSD`ê hat şikand. Dema mirov bixwaze civakeke pêşketî ava bike pêwîst e gava destpêkê wekhevî û demorasiyê pêş bixe û esas bigre.”

**‘Hemû pêkhate dixwazin ku QSD`ê berpisiyarê parastina wan be’**

Rêveberê Meclisa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Berxwedaniya Bendava Tişrînê a gel nayê şîrovekirin, ji ber ku gelê me bi hemû hêza xwe li piştî QSD`a xwe bû û dijmin têk bir. Berxwedaniya Tişrînê ne berxwedaniyek normal bû lê belê ew destanek bû û ket dîroka Kurdan de. Gel me li bendavê xwe dan ber mirinê, da ku bendava xwe radestî dijminê hov nekin. Berxwedaniya Bendava Tişrînê ji bo dijmin nameyek bû ku her kes bizanibe gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê serê xwe ji dijmin re na tewînin. Ji ber ku QSD`ê bi nav û mafê her pêkhateyekî bang dike ewqasî bi hêz bûye. Lewma bila desthiladariya Sûriyê bizane ku wê tu carî Sûriyayeke bê demokrasî û wekhevî newe avakirin. Dema ku gelê Durzî û Elewî banga QSD`ê dikin ku wan ji nav destê komên çete xilas bikin, xwedî sedemekî ye, ji ber ku îro QSD`ê nunertiya gel dike û parastina her mirovekî li Sûriyeyê erka xwe ya bingehîn dibîne.”

# Dilê bawerî û gelên Sûriyê: ‘Siweydeya’!

**Volqan Elî**

Hosteyên şoreşê, di dema xwe da ‘Şerên Gelan’ wekî ‘Cejnên Gelan’ pênase kirine. Ji ber ku di şer û pevçûnan de ji bo gel û civakan dibe ku îhtimala jiyana azad jî peyda bibe, eger gel û civak bi rêxistin bin, ev dahurandin, ji bo hemû rewşên aloziyê derbasdar e. Mînak, di pêvajoya piştî şerê cîhanê yê duyemîn de welatê Vîetnamê bi dehan sal bi dagirkeriya dewletên emperyalîst re rû bi rû ma. Lê ev pêvajoya şer û pevçûnê bi saya rewşa bi rêxistinî ya gelên Vîetnamê, bi serkeftineke bêhempa bi encam bû: Gelên cîhanê, hêzên şoreşger ên wê demê ev rewş bi şiyareke wisa anîn ziman; “Yek, du, sê, hê zêdetir Vîetnam!”. Bê guman ev pêşketin li ser mîrasê manewî yê Şoreşa Mezin a 17’ê Oktobira 1917’an pêk hatibû. Jixwe keda bi îhtişam a gel û gerîlayên Vîetnamê her di dewreyê de bû.

Çi heyf û mixabin e ku hêzên hegemon ku li dijî gelê Vîetnamê di dewreyê de bûn, îro jî li Sûriyê li pişta perdeyê ne. Çawa ku hêzên şoreşger, ji serpêhatiyên gelan tecrûbe derxistine, hêzên hegemon jî ji têkçûnên xwe tecrûbe derxistine. Ji ber vê yekê ye ku deh sal ji beriya vê li cîhanê, li welatê Sûriyê rêxistinên cîhadîst ên wekî El-Qaîde û DAIŞ’ê, ji bo ku gel û baweriyên li herêmê bikevin qirika hev, wekî ‘darikê hewdelê’ hatine bikaranîn. Îro jî bi vê rola bêxêr, HTŞ, radibe!

Çi hêz e ev HTŞ? Me hewl da em li jorî bi hevokekê bidin naskirin. Lê ev kar ne ewqas hêsan e. Dema ku dibêjim ‘ne ewqas jî hêsan e’ ev, ji aliyê nazarî ve wisa ye. Naxwe tu lê binêrî di van heft-heşt mehan de vê HTŞ’ê çi kiriye û çi nekiriye, mirov dê bizane ku HTŞ ‘darikekî hewdelê’ ye; yan ‘darikekî bi sêr ku hemû pirsgirêkên welatê Sûriyê çareser bike’.

Piştî ku HTŞ bi piştevaniya hêzên hegemon, çû li Şamê li ser textê desthilatdariyê rûnîşt, karê wê yê destpêkê bû komkujiya li ser serê gelê Elewî. Çû li beravê xwîna bi hezaran Elewî rijand, bi sedan tecawiz û kuştin; wekî ku Elewiyên Ereb ji Colanî re gotibin ‘tu nikarî biçî li Şamê li şûna Esed rûnî’. Na, ne Elewiyan û ne jî ti kesî tiştekî wisa negotiye. Dibe ku Colanî wisa fêm kiribe. Ji ber wê yekê, çawa li ser kursiyê Esed rûnişt bi demeke kurt berê xwe da Elewiyên ne rexistinkirî û bê amadekarî. Gava ku şûrê cîhadîstan li ser patika Elewiyên Tartûs û aliyê Sahilê bû, ji ber vê yekê Colanî bi îhtimalekî mezin ji kêfan difiriya!

Efendiyên Colanî ku ew ji ser textê rezîltiyê anîbûn Şamê û kiribûn ‘wezîr’ ji vî karî memnûn bûn! Ma çima jê razî nebûna? Karê xwe baş kiribû, fitne û fesadî xistibû nava gel û baweriyên li Sûriyê. Fîtne û fesadiya heyî, hê jî mezintir kiribû. HTŞ’ê ku ji sponsorên xwe yên navneteweyî û bi taybet jî ji dagirkeriya Tirk, aferîn (her bijî!) û bi her şiklê alîkarî girtibû, jixwe ji destpêkê ve di serî de gelê Sûniyên Ereb ên wekî wê ne bi fikra cîhadîst radibûn û rûdinîştin, li Şamê û li derdorê tengnefes kiribûn.

Karê duyemîn ê mezin ê HTŞ’ê, bû êrîşa li ser Suweydayê û derdora wê. Lê encama ku jê dixwest nekarîbû bi destê xwe ve bîne. Çima? Ji ber ku ne di asteke temam de be jî, gelê Suweydayê xwe bi rêxistin kiribû, di astekê de yekîtiya xwe çêkiribû. Ev nayê maneyê ku li wê derê her tişt pir hêsan bû, ti berdêl nehatin dayin. Jixwe, çi li beravê qewimî, hêzên cîhadîst hewl dan li vê derê jî heman tiştî bikin. Lê li berxwedana civaka Durzî terpilîn, her çendî ji aliyê yekîtiya hundurîn ve li hin astengan rast hat jî di encam de Berxwedana Dîrokî Ya Civaka Durzî bi ser ket! Her çendî di vê serkeftinê de berteka Îsraîlê ya li dijî hikumeta demkî û desteka Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi roleke girîng rabûye, lê dîsa jî rola esasî Civaka Durzî lîst.

Bê guman berxwedana bêhempa ya Civaka Durzî destpêkê ji bo wan bixwe, encamên berbiçav afirand: Pir di ser re derbas nebû, civaka birêxistinî ya Durzî hewl da ku rêveberiya xwe ya xweser çêbike. Avakirina hin saziyên xwe yên din ên cuda ragihandin. Halê hazir em van pêşketinên dawî, bi temamî nizanin. Sedema wê: Hem ev pêvajo pir taze ye û hem jî hê xetereya qirkirina hêzên cîhadîst ji ser wan bi temamî ranebûye.

Vê berxwedana civaka Durzî, encameke din jî afirand ku layiqê navê wê ye. Bi qasî tê zanîn wekî peyv ‘suweyda’: Dilê mirov herêma herî bi liv û tevger a laş e. Di heman demê de ji ber vê taybetmendiya xwe, hin herêmên dil xwediyê ezm û aloziyên mezin in. Vaye tam di nîvenga vê herêmên tev bi alûzî û qeyran de hin xal û nuxte hene (suweyda) ku wekî stêrkek di şevên tarî de dibiriqe û derdora xwe ronî dike; aramî û selametê li derdora xwe belav dike. Heman wekî vê, bawermendên Durzî bi berxwedana xwe riya ronahî ya selamet û serkeftinê pêş civaka xwe kirin. Vaye ev berxwedana Durziyên Siwêdayê, ne tenê ew nêzîkî selametê kirin, ji bo tevî bawerî û gelên welatê Sûriyê bû mînakek bijarte ku jê ders derxin!



# ‘Gelên Libnanê piştgirî û hezkirina xwe ji Rêber Apo re nîşan didin’

**Berdevka Kongre Star a Libnanê Leyla Mihemed da zanîn ku beşeke mezin ji welatiyên Libnanî piştgiriyê didin banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk û got, “Beşeke mezin ji welatiyên Libnanî hezkirin û piştgiriya Rêber Apo dikin, ramanê Rêber Apo bandor li gelek kesan kiriye.”**

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Fikir û ramanê Rêber Apo ne tenê bandor li gelê Kurd kiriye, lê belê li tevahî cîhanê gelek kes pê bandor bûne. Rêber Apo bi bîrdozî û felsefeya xwe bala tevahî aştîxwazên cîhanê kişan. Gelek welatiyên Libnanê jî bi fikir û felsefeya Rêber Apo bandor bûne . Rêber Apo di sala 1979’an de derbasî Libnanê bû, li Libnanê gelek kar û xebat kiriye. Rêber Apo û PKK’ê dema ku derbasî Libnanê bûn û xwe li wir bicih kirin, gelê li wê derê gelek bi fikir û ramanê Rêber Apo bandor bûn, herwiha ji dema derbasbûna Rêber Apo ji Libnanê re heya roja îro badora Rêber Apo gelekî li ser gel heye û ev bandor heyanî roja îro hîn didome, Rêber Apo karîbû cihekî xwe yê taybet di dil û mejiyê gel de çêbike.

Di vê çarçoveyê de Berdevka Kongre Star ya Libnanê Leyle Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**‘Her tişt bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ve girêdayî ye’**

Leyle Mihemed destnîşa kir ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo gelê kurd li Libnanê her roj li ser piyaye û wiha got: “Li Libnanê hemû kar û xebatên me girêdayî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bi rêve dimeşin. Herwiha ji bona belavkirina ramanê Rêber Apo di nava civakê de komcivîn, semîner û perwerde têne dayîn, ev yek bi mebesta naskirina fikir û ramanê Rêber Apo û belavbûna wê di nava gel de tê kirin. Di nava civakê de li ser pirtûkên Rêber Apo hertim perwerde tên dayîn, ji milekî din ve jî gelek çalakiyên cûr be cûr ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têne lidarxistin.”

**‘Ramanê Rêber Apo bandor li gelê Libnanê kiriye’**

Leyle Mihemed wiha domand: “Beşek mezin ji gelê Libnanê hezkirinên xwe ji Rêber Apo re nîşan didin. Beşek ji welatiyên Libnanî bi ramanê Rêber Apo bandor bûne, bi teybet ji ber ku Rêber Apo derbasî Libnanê bûye û li wê derê gelek kar û xebat daye meşandin. Di 27’ê Sibatê de banga Rêber Apo ya Aştî û civaka demokratîk hate raghandin, li Libnanê ev bang bi awayekî erênî, hat pêşwazîkirin. Di Libnanê de fikir û ramanê Rêber Apo hatiye belavkirin, ji bo wê jî gelê ereb, xiristiyan û kurd hezkirin û minetdariya xwe ji Rêber Apo re diyar dikin, bi taybet kesên ku Rêber Apo ji nêz ve dîtine; bi Rêber Apo gelek bandor bûne û ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo kar û xebatê dikin.”

**‘Banga Rêber Apo ne tenê ji bo gelê Kurd e, lê belê ji bo tevahî gelên azadîxwaz e’**

Berdevka Kongre Star ya Libnanê Leyle Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Banga Rêber Apo



li tevahî cîhanê dengvedanek dîrokî çêkir, hemû kes, civak, netew, dewlet bi vê bangê û girîngiya wê bandor bûn û bi rengekî êrênî nirxandin.

Ji ber ku her kes baş dizane rêya Rêber Apo rêya çareserî û demokratiyê ye; ev bang ne tenê ji bo gelê Kurd e, lê belê ji bo tevahî gelên azadîxwaz e. Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo serlêdana ji bo rêxistinên mafê mirovan tê kirin, daxwazên gel tê ragihandin, xebatên me tu carî nehatiye rawestandin, hertim çalakî û danasînên ramanê Rêber Apo ji bo civakê tên vegotin û wê hertim berdewam bikin.”

# ‘Şehadeta Mam Zekî bû destpêka berxwedaneke nû’

**Amara Baran/Qamişlo**

**Rojnamevan Argêş Şengalî diyar kir ku Mam Zekî mîna çemê ku di nav zinarên hişk re diherike, di dilê her Êzidiyekî de cihê xwe çêkir û wiha got: “Mam Zekî, mamê her Êzidiyekî ye ku dixwaze di nav azadî û rûmetê de bijî.”**

Di nav her dilopa xwîna ku li ser axê Şengalê rijiyaye de, çîrokek heye. Çîrokek berxwedanê, êşê, û soza ku qet naye jibîrkirin. Lê çîroka herî mezin û bi rûmet, çîroka Mam Zekî ye, mîna stêrkek geş ku di tariya fermanan de rêya civaka Êzidî ronî kir.

**Kurtejiyana Mam Zekî**

Di 28’ê Kanûna sala 1952’an de, li gundê Şimzê yê Êlihê, çavê xwe li cîhanê vedike. Lê ji ber zilma dewleta Tirk, mîna gelek Êzidiyan, ew jî mecbûr dimîne ku bi malbata xwe re koçî Ewropayê bike. Di sala 1979’an de, ew bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re dikeve têkiliyê. Ew di rêxistinkirina civaka Êzidî ya li Ewropayê de dibe xwedî rolek sereke. Di sala 1989’an de, bi fermî beşdarî nava tevgera azadiyê dibe. Piştî girtina wî ya ji aliyê dewleta Elman ve, ew hîn bi hêztir û bi biryartir vedigere xebata xwe. Wî tevî malbata xwe, bi hemû hêza xwe ji bo civaka Êzidî û azadiya Kurdistanê xebat meşand. Di rêya pîroz de, kurê wî Qasim Ozden (Sîpan) û kurê xwîşka



wî Xanê Demîr jî şehîd bûn. Ev êş, wî hîn zêdetir bi têkoşînê ve girê da. Di sala 1999’an de, biryar dide ku vegere welatê xwe. Ew vegera welat, ne tenê vegera cîh bû, lê vegera ruh bû. Bi têkoşîn û xebata xwe, bandorek mezin çêkir. Ew bû Endamê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK). Mam Zekî, bi taybetî ji bo yekîtiya civaka Êzidî têkoşîn kir. Ji ber ku wî qet Kurdistan perçe nedît, timî ji bo yekîtiya neteweyî kar kir. Wî pêşengiya civînên ji bo kongreya neteweyî kir, hewl da ku nakokiyên navbera aliyan bi dawî bike. Lê mixabin, xêrnexwazan nehiştin ev hewildan bigihîje armanca xwe.

Derbarê jiyan û kesayeta têkoşerê Kurd Mam Zekî Şengalî, rojnamevan Argêş Şengalî ji Rojnameya me re axivî.

**‘Mam Zekî ne tenê navek bû, ew ruhê Şengalê bû’**

Argêş Şengalî diyar kir ku wî di sala 2011’an de Mam Zekî nas kir û wiha anî ziman: “ Axaftinên me yên bi wî re, ne tenê nûçe bûn, ne jî tenê nîqaş bûn. Ew, sohbetên ji dil bûn, mîna ku du hevalên hev li ser derd û kulên xwe yên herî kûr diaxivin. Wî her gav bi dil û can, bi fikarên mezin li ser civaka Êzidî diaxivî, bi taybetî jî li ser Şengala ku her gav di bin gefên mezin de bû. Di bername û hevpeyvînên me yên taybet de, wî ronahî dida ser rewşa civaka me û riya derketina ji tarîtiyê nîşan dida. Dema min bihîst ku Mam Zekî şehîd bûye, dilê min perçe perçe bû, qedemên min şkestin. Mîna ku daristanek di nava şevê de bi yekcarî bête şewitandin. Mam Zekî, ne tenê navek bû, ew ruhê Şengalê bû.

**‘Mam Zekî di rêxistinkirina civaka Êzîdi de Rolek sereke leyîst’**

Argêş wiha wiha domand: “Dema çeteyên DAIŞ’ê êrişî Şengalê kirin, Mam Zekî jî berê xwe da Êzidxanê. Wî pêşengiya berxwedanê kir. Ji bo birêxistinkirina Êzidiyan û avakirina Şengaleke xweser, ew bi şev û roj xebitî. Ji ber vê xebata wî, ew di nava civaka Êzidî de bû mîna efsaneyek. Ew ji aliyê gelê Êzidî ve wekî “Mamê Zekî” hate pênasekirinû ev nav di dilê her Êzidî de cih girt.

Parastina Êzidxanê, bû qada ku Mam Zekî pêşengî lê kir. Wî pêşengiya avakirina Yekîneyên Berxwedana Şengal (YBŞ) û Asayîşa Êzidxanê kir. Bi xebat û fedakariya wî, hêzên parastinê mezin bûn û herêm ji DAIŞ’ê hat rizgar kirin. Lê xêrnexwazên ku li ser Êzidxanê hesabên wan ên tarî hebûn, ev rola wî dît û ew kirin hedef.

**‘Şahadeta Mam Zekî ne dawiya çîrokê bû’**

Rojnamevan Argêş Şengalî di dawiyê de balkişand ser şahadet Mam Zekî û wiha pêde çû: “Di 15’ê Tebaxa 2018’an de, piştî ku tevlî merasîma bîranîna qurbaniyên komkujiya gundê Koço bû, Mam Zekî berê xwe da Şengalê. Dema wesayîta wî gihişte Geliyê Şilo yê Çiyayê Şengalê, balafirên şer ên dewleta Tirk bombebaran kirin. Di encama vê êrîşa hovane de, Mam Zekî şehîd ket. Cenazeyê wî, di 19’ê Tebaxa 2018’an de, li pakrawangeha Şehîd Dilgeş û Şehîd Berxwedan a li Çiyayê Şengalê, bi beşdariya hezaran kesan hat oxirkirin. Lê Şehadeta wî, ne dawiya çîrokê bû. Berevajî, ew bû destpêka berxwedaneke nû. Li ser şopa wî, gelê Êzidî îradeya xwe hîn xurt kir. Li cihê ku Mam Zekî lê hatiye şehîdkirin, bîrdariyek hate avakirin û bû cihê ziyaretê. Êrîşa li ser Mam Zekî, ne ya yekem bû û ne ya dawî jî. Piştî rizgarkirina Şengalê ji DAIŞ’ê, gelê Êzidî êdî zanî ku ger ne ew bi xwe xwe rêve bibin, wê her roj di fermanan re derbas bibin. Ji ber vê, wan biryar da ku sîstema Rêveberiya Xweser ava bikin. Ev sîstem, bû hedefa dewleta Tirk û hevkarên wê.”

## FENER



### Destwerdana Tirkiyê, Rola HTŞ û Rêyên Çareseriyê!

**Idrîs Henan**

Dewleta Tirk a dagirker bi destwerdan û daxuyaniyên xwe yên li ser Sûriyê, hewl dide siyaseta hikûmeta HTŞ’ê xêz bike ku li gorî berjewendiya wê be. Lewre jî him li Sûriyê û him jî li herêmê bûye girêka kor û kaniya pirsgirêk û aloziyan. Ji bona tekûzkirina wê siyasetê jî, bi awayên sorkirin û nefretê gelan tîne beramberî hev û li pey şerekî navxweyî yê mezhebperest, etnîkî û olperest e ku zemîna parçekirina axa Sûriyê diafirîne. Çende xwe weke berketiyê Sûriyê jî nîşan bide, lê di cewherê azweriyên wê de kaos kûrkirin e. Ji ber vê jî HTŞ û pozisyona wê ya desthilatdariya li Şamê bikar tîne û bi rêbazên zirlihevkirinan hewl dide raya giştî bixapîne û weke otorîteyeke rewa pêşkêş bike.

Tirkiyê bi koordîna û perspektîfên endazyarê Sayks – Bico, Birîtanya, ku herdu jî bi rola şêwirmendiyê ji hikûmeta Colanî ya HTŞ’ê re radibin, li pey guhertina fîgura DAIŞ`a nû ne û dixwazin di şiklê desthilata nû ya li Şamê xwe daye ferzkirin de, terora DAIŞ kamfûlaj bikin û sûcên wê jî, bi rewakirina HTŞ’ê re, binixumînin.

Tişta berê veşartî û îro eşkere bûye ew e ku bi hemû hêza xwe hewld didin hêza rizgariya gelan a QSD’ê bixin bin kontrola xwe û bi vî awayî teslîm bigirin û tekane statuya demokratîk li Sûriyê ji nav bibin. Her wiha hemû têkoşîna azadî û demokrasiyê li herêm û cihanê, bi rêbaza xweradestkirin, entegreyî bloka radîkal a terora Elqayîde bikin. Wisa jî dixwazin hegemoniya xwe ji nû ve dîzayin bikin, bi amûrên terora global hêz û vîna xwe ferz bikin û herêmê ji bo sedaleke din binexişînin.

Lihevketin û nakokiya perjewendiyên hêzên hegemoniyê li tevayî dunyayê, bandor li hevkariya wan kiriye û rêyek nefesê daye tevgerên rizgariyê ku di heyamekî wisa ewqas faşîst de karibin rêxistinbûna xwe bi awayekî xweser ava bikin. Nakokiyên bi vî rengî avantajek daye hêzên demokrasiyê ku bi îradeya xwe ya cewherî li dora aştîtî û demokrasiyê kom bibin û veguherin tekane hêza xwedî projeya çareseriyê.

Bi qasî ku rejîmek weke ya Tirkiyê li pey eznavendîbûnê bû, îroj bê hevkar maye ku nekariye bi stratejiya xwe ya “Sifir Pirsgirêk” siyasetek xort li Sûriyê bide avakirin. Lewre berê Colanî da Mosko ku bi hêza rojavayî, Siûdî Erebistan û Îsraîlê re belansekî li herêmê û Sûriyê ava bike. Ji xwe li gorî ragihandinê, wezîrê derve yê hikûmeta veguhêz a Colanî ji Rûsya xwestiya; rê li ber destwerdanên Îsraîlê bigire, girêkên bi Durzî û Elewiyan re çareser bike, çekan bide milîs û girûpên HTŞ’ê ku navê artêşê li xwe kirine, li NY piştgiriyê bide rakirina navên HTŞ û Colanî ji lîsteya terorê, ya girîng jî piştgiriyê bide êrişa Tirkiyê û HTŞ’ê ya li dijî QSD’ê. Ango sînaryoyên rejîma Baas dubarekirin e. Bê guman gelek daxwazên Rûsya yên hebûna wê li Sûriyê mayînde dikin jî hebûn.

Tevî vê jî hikûmeta HTŞ ku navbera berjewendiyên hêzên otorîter de pêşbaziya beza bêdawî dike, naxwaze fêm bike ku çareserî bi nexşeriyeke neteweyî re pêkan dibe. Ancax çareseriya guncaw ew be ku; li ser esasê diyalogeka netewî ya rasteqîn ku hemû pêkhate û heyînên Sûriyê bihewîne nav xwe, destûrekî temsîla îradeya gelên Sûriyê bike, sîstemekî siyasî karibe belansê bixe navbera hewcedariyên navendî û nenavendîbûnê ku hemû cudahiyên welat bixe nava xwe.

Weke encam; hikûmeta veguhêz a HTŞ ku li Şamê hatiye bicihkirin, beramberî du rêyên sereke ye. Yan wê di hişmendiya dûvik a Tirkiyê de bi îsrar be, yan jî wê bi diyalog û qebûlkirin nenavendîbûnê û pirrengiya siyasî re pirsgirêka welat çareser bike.